

## **Ji bo dêûbavên, zarokên wan diçin kreşên Berlinê**

03.02.2021

### **Agahiyên ji bo dêûbavan li ser girtina hêlînan a hete 14.02.2021an û her wisa li ser mafê lînêrîna acîl**

Stî û mîrzayên rêzdar, dêûbavên hêja,

Em ji zehmetiyên we yê mezin haydar in, ku ji ber girtina hêlînên zarokan û xebata acîl a navendên lînêrînên zarokan ên danê rojê pêk tên. Ji bo piştgirî û sebra we, em gelekî spasiya we dikin, ku ji bo bi başî derbaskirina vê rewşê pêwîstî pê heye. Kêmbûna hejmarên enfeksiyonê ya niha hêviyê dide me, ku tedbîrên cûrbicûr ên ji bo kêmkirina pandemiyê bandorên xwe nîşan didin, ku tesîra wan li ser tevahiya civakê heye. Ji bo em piştgiriya bidin berdewamiya vê pêşketina erênî, tedbîrên ji bo kêmkirina pêwendiyên di beşa hêlînên zarokan de jî dê di demên pêş de wekî hatine plankirin, bidomin.

Di heman demê de em ji we rica dikin, hûn bi têgihiştineke xweşbîn bizanibin, ku em niha nikarin di derbarê xebata hêlînên zarokan a piştî 15.02.an de bi zelalî agahî bidin we. Ji bo vê yekê divê em pêşî li benda lihevkerina Hikûmeta Federal a bi welatên federal re û biryarên Senatoyê yê girêdayî vê yekê bisekinin.

Bi vê nivîsê re em agahiyên nû û yê temamker ên li ser girtina mesrefên xwarin û vexwarinê, pereyê nexweşiya zarokan û mafê li ser lînêrîna zarokan a acîl ji we re dişînin.

### **Mesrefên xwarin û vexwarinê**

Ji piraniya welatên federal cuda, li Welatê Berlinê di beşa hêlîna zarokan de hîç heq nayê standin. Heqê, ku dêûbav ji bo parçeyek ji mesrefên xwarin û vexwarinê didin, piranî bi qasî 23 Euro ye.

Heqê xwarin û vexwarinê piranî her wisa di dema rojên girtî yê bi rêkûpêkî yan jî di demên nexweşketina zarokî/ê de jî tê dayîn. Heman tişt hete niha her wisa di çarçoweya astengkirina xebata hêlînên zarokan a ji ber pandemiyê jî derbas dibû.

Ji ber astengkirina xebata hêlînên zarokan a domdar me ji saziyên hêlînan bi hêvî xwest, ku ew ji bo meha sibatê heqê mesrefên xwarin û vexwarinê nestînin. Ev yek ji bo wan malbatan derbas dibe, ku zarokên wan di meha sibatê de ji 10 rojan bêhtir sûdê ji xizmeta lênêrîna nagirin.

Ji ber ku heqê mesrefên xwarin û vexwarinê piranî di destpêka mehê de tê standin û di vê demê de bi zelalî hêj ne diyar e, ka malbat dê ji xizmeta lênêrîna zarokan çiqasî sûdê bigirin, loma dibe, ku di demeke paş de hesab were kirin.

### **Pereyê nexweşiya zarokan:**

Bi nivîsa dawî re me her wisa di derbarê derfetên we yê di çarçoweya pereyê nexweşiya zarokan a berfireh de jî agahî da we. Ji ber pirsên cûrbicûr em zelal dikin, ku her wisa kesên mafên wan li ser lênêrîna acîl a zarokan heye jî piranî xwedî maf in, ku pereyê nexweşiya zarokan bigirin, gava ku ew ji ber pêşniyara me, li malê li zarokên xwe binêrin.

### **Bidestxistina mafê lênêrîna acîl a zarokan**

Bi agahiya xwe ya dawî ya ji bo dêûbavan me di derbarê bidestxistina mafê lênêrîna acîl a zarokan de agahî dabû we. Ji kerema xwe re bila li bala we be, ku divê pêdiviyê awarte û acîl a ji bo lênêrîna zarokan hebe, bo nîmûne, ji ber ku ji bo lênêrîna zarokan wekî din hîç derfet tune be. Karekî bi awayekî fermî wekî pişeyekê bi sîstemê ve girêdayê bê qebûl kirin bi tenê serê xwe ji bo bidestxistina mafê lênêrîna acîl a zarokan têr nake.

Da ku bi teqezî ewle be, ku armanca kêmkirina pêwendiyên bi berdewamî dikare were parastin, divê barê navendên lênêrîna zarokan a danê rojê ji sedî 50 derbas nebe.

Ji ber sedemên xebatkar û rêxistinkirinê dibe ku navenda hêlîna we di rewşên taybet de mecbûr bimînin, ku bi lihevkarîna li gel çavdêriya hêlînên zarokan, demên vekirina hêlînê kêmkirî. Em hêvî dikin, ku hûn xweşbîn nêzîkî vê yekê bibin.

**Ji bo zelalkirina pirsên di derbarê mafdariya li ser lênêrîna acîl a zarokan xeta telefona acîl a dêûbavan a Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan bi berdewamî di xizmeta we de ye. Hûn dikarin bi vê hejmarê 030 - 90227 6600 di tevahiya rojên xebatê de ji 9an hete 15an xwe bigihîninê.**

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk